

# BALINDE

gul in li asmanan difirin



Nêzîkî 9000 cûreyên balindeyan li ser rûyê erdê hene. Hinek ji wan pir biçûk in, wek şîravmêjka perhejînk ku dirêjahîya wê şeş cm ye û giranîya wê du gram e. Hinek jî gelek mezin in; wek hêştirmelê ku bilindîya wê nêzîkî sê metreyî ye û giranîya wê 150 kîlogram e.

Balinde bi form, reng û xwarina xwe ji hevdu gelek cuda ne. Lê bi giştî hemû xwedîyê hin nîşanên hevpişk in ku wan ji heywanên din cuda dike. Bo nimûne hemû balinde bi per û pûrt in. Bi wan per û pûrtan tîna (germahî) laşê xwe diparêzin. Her weha hemû balinde bi bask in, bi wan baskan difirin. Hin balinde hene ji ber giranîya laşê xwe nikarin bifirin, an jî baskên xwe ji bo karekî din bi kar tînin. Bo nimûne kîvî, hêştirmel, pengûen. Hêştirmel baskên xwe di bezê de bi kar tîne, pengûen di ajnêkirinê de bi kar tîne.

Hemû balinde hêkan dikin û piştî ku li ser wan hêkan kurk dikevin çêlik jê derdikevin. Balinde jî wekî hemî ajelan



şîravmêjk



kîvî



legleg



hêştirmel



pêwîstîya wan bi xwarin û vexwarinê heye. Xwarina wan jî gelek cure ne; ji şîrava kulîlkan bigre heta bi mêş, mûr, dan, tov, masî, beq, mişk, cird û kevroşk. Mirov dikare ji nikilê wan fam bike ka ew çi dixwin.

Piranîya balindeyan hêlînan çêdikin. Hêlîna hinekan bi rastî nimûneya hunera endazyariyê ne.

Ji balindeyan hinek xwecî ne, ango sal dozdeh meh li ciyekî dimînin, wek kew, sîsik, por û gelekên din. Hinek jî mişext dibin, behar û havînan li cihekî ne, payîz û zivistanan li cihekî dî ne, wekî legleg, mêşxurînk, hacîreşk û gelekên din.

pengûen

